KOÇER...

Evdile Koçer

Zana ye... dunya bîrek kûr, birekek tûj e.

Wek dayikek dilşewitî, divê destê te li ser pişta civakê be: Ji elîf-bê bigire heta elîf-nemayê bêyî ku bi xwe bihese, divê tu fêrî civakê bikî. Nexwe dê civak bi elîf-bêya xwe ve te vebikêşîne nav bîra xwe û dê hemû bîr û boçûnên te bide ber bireka xwe ya tûj.

Zana ye... dunya keniyek kin, bişirînek xweşik e.

Kenî, di nav êşa giryanê de meyiya ye. Bişirîn, gulên êşê vedide; tîqetîq jî peqpeqokên vê êşê ne. Keniyê herî xweşik, êşa dayikên bêçare ye. Diyariya herî sipehî, baqek ji keniyê vê êşê ye.

Zana ye... dunya çemê xweşmêran, behra mirovan e.

Tu di çemê xwe de nizanibî soberberî bikî, tu yê di behra mirovan de hêdî hêdî bixeniqî. Ji ber ku, çem havêna behran; xweşmêr tevna mirovan in.

Tu di çemê ziman û çanda xwe de nizanibî avjeniyê bikî, tu dê di deryaya ziman û çandên din de bixeniqî. Ji ber ku, ziman dîmenê ruhê ye û çand nexşê hebûna te ye.

Zana ye... dunya çîrokek dûvdirêj, romanek nenivîsandî ye.

Çîrok neynika civakan in: civakên ku çîrokên xwe zûka nenivîsînin û navekê lê nekin, dîsan gazî êş û trajîdiyên xwe dikin. Ji ber ku, nivîs êş û trajîdiyan kedî dike.

Tu çîroka trajîdiya xwe bi xameyê xwe nenivîsî, dê ew bi xameyên kirêkirî bihên nivîsandin.

Zana ye... dunya kaxezeke sipî, pênûsek keskesor e.

Kesên ku bi tenê navê xwe li ser kaxezê reş dikin û digindirînin meydanê, hêj ava felsefeya nivîsê danequrtandine. Heger ewan, kesên ku xepara biriqandina gotinan dikin, bidîtana, dê xwe dîsan bigindirana wê meydanê û bi têra dilê xwe ji xwe re bigîriyana.

Zane ye... dunya aşê huneran, bostanê çandan e.

Aşê huneran li her derê di destê hunermendan de ye. Lê, demê ku hunermend ne li ser kar bin, çeqçeqoka hunerê dadikeve destê zarok û mindalan.

Tu çanda xwe di kûrha xwe de nepehtînî û nanê wê yê germ pêşkêşî dunyayê nekî, dê ew çand berê xwe bide kûrheyên xelkê.

Zana ye... dunya labîranta qehremanan, gerîneka xayînan e.

Xayîn û qehreman, cêwiyên hev yên evdalî û korezaniya me ne. Dêbavê wan civak e. Ma ez ê çi bibêjim: herî sipehî, ew herdu hevûdu nas dikin.